# *Axlîma (Pêlên helbesta kurdî)*

*Axlîma (Pêlên helbesta kurdî*) ........................................................ 1

Mela Nûriyê Hesarî

# Axlîma

*(Pêlên helbesta kurdî)*

**Mafê çapkirin û belavkirinê parastî ne**

Navê pirtûkê

# Axlîma

**(Pêlên helbesta kurdî)**

Daner:

**Mela Nûriyê Hesarî**

Pêşgotin:

**Dilawerê Zengî**

Tîprêzî, Bergsazî û rûpelsazî:

**Şengo Dumilî**

Çapa duyem

**2724k - 2024z**

Qamişlo - Roavayê Kurdistanê

Çapxane:

**Mîran**

Qeware: 14c.m X 20c.m

Jimara rûpelan: 100

# Pêşgotin

Xwênerên hêja, di serî de, pêwîst e em hinekî li ser zanîna erûzê û giringiya wê bipeyivin. Ji bo pirtir armanc, xwestek, giringî û daxwazên vê pirtûkê li ber çavên we zelal bibin. Zanîna erûz, komek azîneyên ku terazû û pîvana rast nîşan dide, şihîna rast a helbesta Kurdî ji ya şaş tê zanîn. Ev e zanista ku bi lêkolîna azîneyên ku helbestvan ji bo bidestxistina pîvanên helbestî yên rast dişopîne re têkildar e. Ev yek bi pîvaneke rast tê kirin ku bi wan şihînên rast ên helbesta Kurdî ji yên nerast tên naskirin.

Girîngiya vê zanînê di wê yekê de ye ku, ew navgînek dûzkirin û paqijkirina behre û jêhatiya helbestvan e. Ev ji wî re dibe alîkar da ku bê şaşî helbestê bixwîne. Di heman demê de jî, ji wî re dibe alîkar ku helbestê bi pîvaneke hevgirtî û pêkhatina awazê bibêje, û bi vî awayî nivîsandina helbesteke ku çêja hunerî hildigire. Her-

weha, ew dihêle ku xwendevan, xwendekar û rexnegirê helbestê şaşiyên di malikên sazkirî de nas bike. Ji ber vê yekê, ew dikare di derbarê helbestê de hem dadbariyeke rast bike, hem jî jê re şiyana cudahiyê dide helbest û pexşana ku di xwezaya xwe de nêzî helbestê ye. Şiyana zanîna peyvên helbestzanî yên ku di kelepûra helbestê de cih digirin, dihêle ku xwendevan bi rengekî rast helbestê bixwîne. Pisporên di warê mûzîkê de erûzê bi muzîkê ve girê didin. Ew herdu jî parvekirina hevokan li ser tîpên dengnasî, yên ku di dirêjahî û kurtahiyê de ji hev cuda ne, parve dikin. Helbest bi pîvan û rîtmeke yekreng ve girêdayî ye, yanî axaftineke hevseng e.

Rast e ahingên di helbesta bikêş de, weke noteyên mûzîkê tiştekî cîhanî ye. Lê, her neteweyekê ev ahing li gor taybetmendiyên zimanê xwe ji bo xwe guherandine, û navê xwe lê kirine. Her zimanek taybetmandiyên xwe heye. Aheng û rîtma helbestên bikêş û bare beşeke bingehîn û herî girîng a wan e, û mûzîkeke hundurîn dide wan. Erûza Erebî ne li gor zimanê Kurdî ye û ji Kurdî re qet ne bikêr e. Kêşeyên helbesta Kurdî, di erûza Erebî de gelekî sînûrdar û hejar mane. Ev jî lawaziyek e ji bo hel-

besta Kurdî. Gelek caran helbesta Kurdî ya bikêş bi destê hin helbestvanên Kurd dûrî kok û rehên kêşên Xelîlê kurê Ehmedê Ferahîdî ketine, lê dîsa jî rêyeke zelal nedane diyarkirin. Di vî warî de, çend hewildanên baş û hêja bi destên ronakbîr û nivîskarên Kurd çêbûn; her yek ji wan li gorî şiyan û karîna xwe pirtûk çêkirine û hin nerîn û dîtinên hêja anîne meydanê. Yek ji van ronakbîr û nivîskaran Seydayê hêja û gewre Mela Nûriyê Hesarî ye. Mela Nûrî pirtûkek bi navê "Axlîma" li ser pêlên helbesta Kurdî nivîsandiye. Wî ev pirtûk ji bo derxistin û terxankirina kêşa helbestên Kurdî afirandiye. Ev pirtûk ne tenê ji bo helbestvanên Kurd giring e, lêbelê ji bo zimanzanên Kurd jî pir pêwîst e.

Seydayê Mela Nûrî bi şêweyekî zanistî û li ser koka taybetmendiyên zimanê Kurdî, ahingsaziya helbestên Kurdî bi awa û şêweyekî li gorî zimanê Kurdî terxan kiriye. Digel zanîna erûzê, bare û kêşa helbestan û pêlên dengan û pêlên erûzî ji xwendekaran re baş şirove dike; û eve jî karekî bêheval e.

Seydayê gewre, di destpêka pirtûka xwe de (Axlîma), dibêje: Çi peyv û xwendina ku hebe bi danheva dengê (Kitwaz) çêdibe. Vêca her den-

gekî tenê (Kitwaz) ji hinek tîp çêdibe, her çend tîpên ku digihên hev navek û hijmarek ji wan re heye. Tîp jî çend beş in, her beşekî navek û hijmarek ji wan re heye. Ewî tîpên kin û dirêj, nerim û sert (hişk) ji hev cuda kirine, û bi nimûneyan pir zelal dane xuyakirin. Tîpên sert û nerim bêyî hev peyvan çênakin. Di rêya van her neh beşan re: (Kit, Ker, Şikeste, Movik, Guvişk, Goşî, Tiqal, Xelek û Destek) dabeşkirî, diyarkirî û binavkirî ne. Herweha, ji daneheva her du beşan, hişk û nerim, çend hawê peyvê çêdike. Ristehû-nandina bi jendinê, û jendin jî bi dengê hijmartî binav kirine. Ew dengên hijmartî (pîvanok) jê re hene. Mercên ristehûnandinê di pênc xalan de dibîne: (1-Pîvanok 2-Kerta lêwest 3-Birek 4-kerta hevgorî 5-Malik). Ev ristehûnandin bi gelek awayan e, hin kin in, hin dirêj in, hin fer in, hin zo ne, hin sivik in, hin giran in, hin sergirtî û paş-girtî ne, hin sergirtî û paşvekirî ne, hin servekirî û paşvekirî ne. Birek ji hinan sêdeng in, hin çar in, hin pêncdeng in, hin şeş in, hin heft in, hin heşt in, ta bi pazdeh û şazdehan e. Li gorî ew dibîne, divê lêpîvek ji tevan re hebe. Vêca, ji ber ku (Ristehûn) bi jendinê çêdibe û jendin jî zinge-zingê dike, ewî hîmê lêpîvê ji (zing) wergirtiye.

Ewî li ser vê bêjeyê ji tîpên wê yên sert her bêhtir kir, û li gor hemî movik û şikesteyan, tîpên nerim anîn û birek jê çêkir, û birekê ristan jî li ber wan pîvan. Bi zelalî li ser dabaşa (pêlan) û jendin û navlêkirina wan (lêpîv) û berpîvên wan sekiriye û xweş pêl bi pêl şirovekirine. Jendina her pêleke wê bi hawakî û pîvanekê daye xuya-kirin. Evên dengên wan zo zo ne, ji (4) ta bi (16)an du beş in; beşek kerta (hevgorî) di paşiya çara (4) û şeşa (6) û heşta (8) de tên. Beşê dî kerta (hevgorî) nayê, lê kerta (lêwest) tê; ango, ya ku ne weke ya berî xwe ye. Lê, mirov di paşiya birekê de, lê diraweste, û kerta (hevgorî) di paşiya (12)an yan (16)an de tê.

Di dawiya pirtûka xwe de, bêjeyên babetî û ristan, yek bi yek, di (27) xalan de şirove dike û pirtûka xwe bi hinek beşên ristan bidawî dike.

Hezar dilovaniya Xwedê li giyanê seydayê Mela Nûriyê Hesarî be û cihê wî Buhişta rengîn be.

**Dilawerê Zengî**
Qamişlo- Roavayê Kurdistanê
01.09.2024

# *Axlîma*

## *(Pêlên helbesta kurdî)*

# Axlîma

## (Pêlên helbesta kurdî)

Birayê Kurd, tu bizanibe çi peyv û xwendina ku hebe bi danheva dengê (**Kitwaz**) çêdibin.

Ev peyv (**Belave**) û (**Ristehûn**) jî heye.

**Belave**: Ew e, ku kîjan peyv bivê wê bênî guhdanî hijmara dengan. Weke tu bibêjî:

Divê ez rabim herim, karê min heye.

Ezê herim hûremûran ji zarokan re bênim.

Dostekî min î nexweş heye, divê ez serikî bidime wî jî.

Vaye civînpeyv (25) bêjene, hinek kin in, du deng in, yek deng in, hinek sê deng in û paşî, hijmar û pîvan ji wan re nîne.

Heçîka (**Ristehûn**) ew jî ji denga ye, lê dengê wê bi hijmar in, birekê wê hene. Heye bêjeyek bibî du ker kerek bikevî bireka pêşî û kerek bikevî bireka paşî.

Vêca her dengekî tenê: (**Kitwaz**) ji binek tîp çêdibe, her çend tîpê ku digihên hev navek li wan heye û hijmarek ji wan re heye.

Tîp jî çend nifş in, her nifşekî navek û hijmarek ji wan re heye.

**Tîpên kurdî hemû ev in:**

A, B, C, Ç, D, E, Ê, F, G, H, 'H, I, Î, J, K, L, M, N, O, P, Q, R, S, Ş, T, U, Û, V, W, X, 'X, Y, Z. (33) çêbûn.

**Ji van tîpan tîpên ziwa hene, ew jî ev in:**

A, C, Ç, D, F, G, H, 'H (ح), J, K, L, M, N, P, Q, R, S, Ş, T, V, W, X, 'X (غ), Y, Z. Ev bûn (25).

**Û tîpên nerim hene, ew jî ev in:**

A, E, Ê, I, Î, O, U, Û, Heşt in (8).

**Ev tîpên nerim dirêj hene:**

A, Ê, Î, O, Û . Pênc in.

**Û kin hene:**

E, Ê, U . Sisê ne.

Ev tîpên nerim ku li pey tîpeke ziwa bêne gotin weke me got: Nerim in. Wek:

Ma, me, mê, mi, mî, mo, mu, mû, man, men, mên, min, mîn, mon, mun, mûn.

Dûv re ev tîpên nerim ku tenê bêne gotin, yan di serê bêjeyê de bêne gotin, hingî ne nerim e, dibe (Hestî) yanî hişk e, wek:

A, E, Ê, I, Î, O, U, Û çaxê tenê:

Im, am, em, êm, îm, om, um, ûm.

Dûv re tîpên ziwa û nerim bêyî hev nayên gotin, û peyv çênabin û ji daneheva herdû nifşan çend hawê peyvê çêdibin.

Ên ne nerim tenê ew (Hestî) ne.

**Kit**

I, Î, U, Û, A, E, Ê, O

Ev tîpên hestî ku tîpeke ziwa pey wan de bê, tê gotin:

## Ker

Im, am, em, êm, îm, om, um, ûm.

Ku tîpeke ziwa bê û dûv re yeke nerim bê ew dibe:

## Şikeste

na, ni, nî, nu, nû, ne, nê, no

Ku tîpeke nerim bikevî nîvê du tîpên ziwa ew dibe:

## Movik

zor, zer, zêr, zar, zîr, zir, zur, zûr

Ku tîpeke hestî bê û pey wê de du tîpên ziwa bi hev re bên, ew tê gotin:

## Guvişk

ank, enk, ênk, onk, ink, înk, unk, ûnk

Ku tîpeke ziwa bê û dûv re yeke nerim bê û dûv re dîsa du tîpên ziwa bi hev re bên, ew tê gotin:

**Goşî**

dang, deng, dêng, dong, ding, dîng, dung, dûng

Ku tîpeke hestî bê, dûv re şikesteyek bê, tê gotin:

**Tiqal**

aka,  eku, eki, oke, îka, uki, uku

Ku tîpeke hestî bê, dûv re movikek bê, tê gotin:

**Destek**

akum, ekam, êkom, okem, ikum, îken, ukem, ûkim.

Ku şikesteyek bê, dûv re movikek bê, tê gotin:

**Xelek**

Kîkam, kakum, kêkom, kêkem, kukem, kukam, kikem.

Ev her neh nifş ku hestî û tîpên dirêj, di wan de bên ew ê dirêj bin.

Me berê gotiye kitên dirêj ev in:   a, î, ê, û, o

Û yên kin ev in:   e, i, u

**Ker** a dirêj:  ak, îk, ûk, ok, êk

**Ker** a kin:  ek, ik, uk

**Şikeste** ya dirêj: lî, la, lû, lo, le

**Şikeste** ya kin: le, lu, li

**Movik** a dirêj: par, pîr, pûr, por, pêr

**Movik** a kin: per, pir, pur

**Guvişk** a dirêj:  înc, anc, ûnc, ênc, onc

**Guvişk** a kin:  enc, inc, unc

**Goşî** yê dirêj: rang, rêng, rîng, rûng, rong

**Goşî** yê kin:  reng, ring, rung

**Destek** a dirêj: azar, îzîr, êzêr, ozor, ûzûr

**Destek** a kin: ezer, uzur, izir

**Destek** a dirêj û kin: îzer, ozer, ûzer, azer

**Destek** a kin û dirêj: ezar, ezîr, ezêr, ezor, ezûr

**Tiqal** a dirêj: aza, îzî, êzê, ozo, ûzû

**Tiqal** a kin: eze, uzu, izi

**Tiqal** a dirêj û kin: aze, îze, êze, oze, ûze

**Tiqal** a kin û dirêj: eza, uza, iza

**Xelek** a dirêj: mîzîr, mazar, mozor, mêzêr, mûzûr

**Xelek** a kin: mezer, mizir, muzur

**Xelek** a dirêj û kin: mazer, mîzer, mozer, mêzer, mûzer.

**Xelek** a kin û dirêj: mezar, mezîr, mezor, merêz, mezûr.

Ev bûne (24) nifşê kerpeyvan û ji van pê ve çênabin.

Tenê ev heye ku tîpa (w) pey tîpa (x) de tê, çi tîpa ku pey wê (w) de bê, têde winda dibe, ew û (w) dibe yek tîp, çi şikeste weke (xwe) yan movik weke (xwar).

# Ristehûn

Emê niha vegerin ser (Ristehûn)ê, ristehûn çiye? Ev peyve ku bi jendin tê gotin. Ew jendin jî bi dengê hijmertî tê gotin. Ew dengê hijmartî (pîvanok) jê re hene. Bi kêmanî divê du pîvanokê weke hev hebin.

Her (pîvanokek) dibe çend birek, her birekek an sê deng in an çar deng in.

Her malikek du birek an sê birek an bêhtir in.

Her paşiya malikekê divê qetristeke lêwest hebe.

Ew qetrista lêwest divê di paşiya du malikan de, li gor hev bin. Weku herdû movik dirêj bin an herdû movik kin bin an jî herdû şikesteya dirêj bin an herdû şikesteya kin bin.

Her pîvokekê ku dengên wê zo bin, ku bê (qetgorî) be, divê ne kêmî (8) dengan bin û ne bêhtir ji (16) dengan bin.

Her pîvokekê ku dengên wê fer bin, ku bê (qetgorî) be, divê ne kêmî (6) dengan be û ne bêhtir ji (15) dengan be.

# Mercên ristehûnê

1-**Pîvanok**: Yanî divê pîvana du malikan weke hev bin.

2-**Kerta lêwest**: Ev dengeke yan du deng in, di paşiya du malikan de tê.

3-**Birek**: Her malikek divê çend birek têde hebin. (Birek) ji çend dengan e yan dengê fer an ê zo ne.

4-**kerta hevgorî**: Ev, ew e ku di paşiya du malikan de şikesteya paşî ji hev bin û şikesteya berî ya paşî tîpa nerim di herdûka de, ji hev be û tîpa ziwa di serê wê de bê guhertin.

Hem divê movik paşiya herdûka tîpa ziwayî paşî û tîpa nermî berî wê ji hev bin, û tîpa ziwa ya serê movikê bê guhertin.

Divê kerta (hevgorî) di rista deng zo de kêmî dengê çaran neyê.

Divê kerta hevgorî di rista deng fer de kêmî dengê sisiyan neyê.

5-**Malik**: Her ristek ji çend malikan çêdibe; yan dido yan sisê yan çar yan pênc û her wilo.

Dûvre, ev ristehûn bi gelek hawa ye, hin kin in, hin dirêj in, hin fer in, hin zo ne, hin sivik in, hin giran in, hin sergirtî û paşgirtî ne û hin sergirtî û paşvekirî ne, hin ser û paşvekirî ne.

Birekê hinekan sê dengîn in, yê hina çar in, ê hina pênc dengîn in, hin şeş in, hin heft in, hin heşt in, ta bi pazdeh û şazdehan e.

Ji ber wilo divê lêpîvek ji tevan re hebe.

# Lêpîv

Ew e ku bêjeyek hebe ji çend tîpan li gor birekê ristan. Vêca ew lêpîv tim wek xwe ye, tîpê wê nayêne guhertin.

Lê, tîpê berpîv têne guhertin li gor bêjeya ku tu bênî.

Vêca, ji ber ku (Ristehûn) bi jendinê çêdibe û jendin ji zingzîngê dike, emê hîmê lêpîvê ji (zing) çêkin.

Emê li ser vê bêjeyê ji tîpê wê yî ziwa her bêhtir bikin û emê li gor hemî movik û şikesteyan tîpê nerim bînin û emê birekan jê çêkin û birekê ristan jî li ber wan bipîvin.

**Kîtwaz**: Dengek tenê ye. Kîtwaz ew e ku çaxê mirov dibêje bi yek dengî derdikeve, tu nikarî bikî du qet, lê di nivisandinê de heye yek tîp be, weke çaxê ku tîpeke nerim be.

Wek: A, Î, Û, Ê, O, E, U, I .

Ji bil vê heye du tîp bin wek çaxê ker û şikeste.

**Ker**: îm, am, êm, ûm, um, em, im, om .

**Şikeste**: mî, ma, mê, mû, mu, me, mi, mo .

Û heye sê tîp bin, wek çaxê ku ev bin:

**Movik**: hun, mer, sar, kol ...

**Guvişk**:  eng, urz, ard, ift ...

Û heye çar bin, wek:

**Goşî**: hîng, çing, bend, kund ...

Ev çar tîp in, lê dîsa tu nikarî bikî du deng û heye dengek be.

**Heçîka**:

**Tiqal**: îkî, eke, êkû

**Destik**: eger, ekûr, ajêr

**Xelek**: meger, şekir, cotar

Ev her sê du deng in.

Ev kitwazên yek û du tîpî di ajotina jendinê de, dikevine nav birekan û nayêne şikandin.

**Kît**: weke:

Heçî (ê) ciwan

herin ser êwan

Vaye (ê) di malika pêşî de kit e û di bireka didiwan de maye weke xwe.

**Ker**: weke:

Bixin (ûr) xencera

Hilfirînin sera

Vaye (ûr) di malika pêşîn de – kere û di bireka pêşîn de maye wek xwe.

**Şikeste**: weke:

Ezê bidim (kê)

(Vê) mamiza (mê).

Vaye di vi de (kê) di bireka pêşî de û (vê) û (mê) di ya paşî de, her sê mane weke xwe nehatine şikestin.

Herçîka (kitwazên) sê û çar tîpî ku tîpa nerm di paş wan de bî, weke:

## Tiqal

Ew berê şikestî ye, hew tê şikandin. Weke tu bibêjî:

(aşê) evînê      radikî kînê

Vaye (aşê) tiqal e, di bireka pêşî de weke xwe maye.

Wiha reng e çi bêjeya hebe, ku tîpeke nerim di paş wê de hebe, dîsa bi tîpa berî xwe ve dilakî weke berê.

Çi tîpa hestî pey wê tîpa nerim de bê. Wekî tu bibêjî:

Ge lî bi (ra) ê var re

Me kî ê rîş ne yar e

Vaye (a) di paş –bira- de, di malika pêşî de hatiye û weke xwe maye.

Û çi tîpa ziwa be, weke tu bibêjî:

Gelê kur(da) rabin

Bi serbestî şa bin

Vaye (da) di paş bêjeya (kurda) de tîpa nerim e û weke xwe maye û tîpa ziwa ku (r) di bêjeya (rabin) de piştî wê re hatiye.

Lê evê sê û çar tîpî ku tîpa ziwa di paş wan de be weke (movik) û (goşî) ku tîpeke ziwa pey wan de hat, dîsa wê her sê weke xwe dimênin.

**Movik** weke:

(ev) (pîr) bûye kal

Bi min re he val

Vaye bêjeya (pîr) movik e paşiya wê tîpa ziwa ye, ku (r) ye, pey wê de tîpeke dî ziwa hatiye, ku tîpa (b) ye, bêjeya (bûye) de vaye (pir) yekdeng û mokek xwe maye.

**Guvişk** weke:

Ev (anc) bilind û kevir e

Ava li ser nêve gir e

Vaye (e) di (anc) de ziwa ye (b) peyde hatiye ziwa ye ev (anc) weke xwe yekdeng maye.

**Goşî** weke:

Ev gund çi şên û fireh e

Pir bi şikeft û keleh e

Vaye (d) di (gund) de ziwa ye (ç) peyde hatiye, ew jî ziwa ye (gund) weke xwe maye, yekdeng û neşikestî ye.

Wiha reng e jî pey van hersêka de dîsa her sê nayêne şikandin.

**Movik** weke:

Ev (gul) ala û bên xweş e

Naz û delal û pir geş e

Vaye (gul) berî (a) weke xwe maye, lewra (a) hestî ye.

**Guvişk** weke:

Ev (isk) eger hênik nebin

Çav û ceger wê berze bin

Vaye (e) piştî (isk) hatiye, (isk) wek xwe maye, ji ber ku (e) hestî ye.

**Goşt** weke:

Rû (şeng) evînê çêdikin

Cergê evîndar jêdikin

Vaye (e) hestî ye piştî (şeng) hatiye. (Şeng) weke xwe yekdeng maye.

Heger tîpa nerim hat piştî (movik) û (guvişt) û (goşî) hingî tîpa ziwa ya paşiya hersêka de xwe ji pêş diveqetênî û bi ya nerimî paş re dibe heval û dengekî dî jî çêdibe.

**Movik** weke:

Niha (pîrê) me xwenda ne

Ne wek pêşî di benda ne

Vaye (pîr) movik bû, yekdeng bû, tîpa (ê) pêv hatibû du şikeste yanî bû; (pî, rê) (r) veqetiya.

**Guvişk** weke:

(anca) me hin û bedew e

Gelkî xweş e li ser xew e

Vaye (anc) yekdeng bû, ku (a) hatibû du deng û şikest, yanî (an, ca)

**Goşî** weke:

Penga mi nerim e, nerim û sade

Bi destê nazik dilberê wê bade

Vaye (peng) yekdeng bû, (a) hat ew kire du deng û şikest yanî bû (pen, ga) movikek û şikesteyek.

Vêca me berê got: (ristehûn) bi jendinê çêdibe, (jendin) jî ji dengan çêdibe, (deng) jî ji her şeş (kerepeyv)ê çêdibe ku:

Kit: a, î, û, ê, u, o, i, e

ker: im

Şikeste: mi, ma ...

Movik: mir, mar ...

Guvişt: îsk, anc, isk...

Goşî: hing, şeng, rast

Vêca yek tenê ji van ku tu dirêj bikî û bibêjî, çênabî û nedibî (peyv) û nedibî (risthûn) weke tu bibêjî:

I i i a a a o o o ...

az az az ...

ke ke ke ...

viz viz viz ...

end end end ...

şing şeng şeng

lê, ku kîjan ji te re, ji vana pêwîst bû, te anî û te tevlihev kirin û te guh neda hijmar, hevgorî, lêwesta, pîvanok, lêpîv, berpîv, malik, jendin û rêz û ristan, ew dibe peyv.

Çaxê tu bixwazî wan bikî (ristehûn) divê tu hay ji van tiştan tevan hebî:

**- Jendin**: Yanî divê mirov karibe xwe pê re:

Hilkutênî sivik giran nîvdar

Hûrizî bikî sivik giran nîvdar

Bêlute bikî sivik giran nîvdar

Dan bikutî sivik giran nîvdar

Distar bihêrî sivik giran nîvdar

Hespê bibezênî sivik giran

Hasin kute bikî sivik giran

Ber bi al û serwerde herî sivik giran

Êrîş bikî ser dijminan sivik giran

Çepka bidî sivik giran

Û gelek tiştên dî jî hene.

Me berê gotiye gelek hawê ristehûnê jî hene:

(sivik), (nîvdar), (giran), (kin), (nîvdar), (dirêj), (ser û bin movik), ser movik, bin şikeste, ser şikeste), paş movik.

Vêca tu van nehan li nehan xî; dibine (81) hawe û heye bêhtir bin û heye kêmtir bin.

Ji ber vê pirbûna wan divê tu her hawekî ji wan bikî pêlek, yanî weke pêlê avê diçin û tên, wê bibin gelek pêl.

Her pêlek divê tu navekî lê deynî, her navek ji çend bêjeyan, li gorî rengê wê pêlê bê çêkirin.

Her pêlek pîvaneke wê heye. Divê malikê wê pîvanê bi kêmanî dido weke hev bin.

Her malikekê bi kêmanî divê birekek be û çêdibe du birek bin, yan sisê bin, yan çar bin.

Çaxê paşiya malikê (hevgorî) bê, divê kerta (lêwest) hebe.

Çaxê kerta (hevgorî) hebe, tu karî gelek (birek)a bi kêfa xwe çêkî.

Vêca divê her (birekek)ê (lêpîvek)ê wê hebe, ji tîpên bêjeya (zing), her wekî me berê gotiye.

Vêca, ji ber ku ajotina (ristehûn)ê ti carî di hawê kerpeyvan de weke hev dernakevin, ji ber wilo tu nikarî (lêpîv)ê li gor hev çêkî.

Weke em bibêjin:

Ma hey fe lek hê jî ne bes

Ta kî bi bin em bi xwe dî

Lêpîva wê ji (zing)ê, divê em halo bibêjin, ku li gor wê be:

**Ma hey fe lek hê jî ne bes**

Za zen ze zen ze zî ze zen

**Ta kî bi bin em bi xwe dî**

Za zî zî zin zen zî ze zî

Vaye di ya pêşî de (5) şikeste û (3) movik hene.

Lê ew movik û ew şikeste ne li dehma hev in û her yek ji wan heşt deng in. Tu karî wan bikî du birekê çare çar a pêşî tê bibêjî:

Za zen ze zen

Ze zî ze zen

Ya din tê bibîjî:

Za zî zî zin

Zen zî ze zî

Ristehûneke dî:

**Em kur dis ta nê î ro di xwa zin**

Zen zun zin za ze zî zo zî za zin

**Em tev hiş ya rin ho za nû ba zin**

Zen zen zin za zin zo za zû za zin

Di ya pêşî de (6) şikeste û (4) movik hene.

Di ya dî de (5) şikeste ne û (5) movik in û dîsa jî ne li dehma hev in.

Naxwe em ti carî nikarin (lêpîv)a li gor (qetristê) zimanê kurdî tevî çêbikin. Tiştê em karin emê (lêpîv)ê li gor qetrista hevgorî ya paşiya malikan çêbikin. Di gel ku du dengê dî berî wê jî, ji ber ku kêmê birekê (zodeng) du deng in.

Û kêmê birekê ferdenga (3) deng in, ku me li gor van herdû bireka di paşiya ristehûnê de çêkir.

Her malikê ristehûnê sê deng û çar deng tenê bin, ji xwe hingî ji bêgavî lêpîv û berpîv ku (ristehûnê) wê bibin weke hev.

Ku bêhtirî sisiyan û çaran bin, emê wana pêşî jî li wê gorê bibêjin.

Vêca, çaxê birek sê dengî be, yan du dengî be, di hingî de heye tîpê nermî dirêj bên, heye yê kin bên. Ê kin sisê ne û yê dirêj pênc in.

Emê hersêkê kin bênin, yanî: zu ze zi

Emê sisiyan ji yê dirêj jî bênin: zû za zî

Em karin kintir bikin ji yê kin yekê bêjin (ze) û ji yê dirêj jî yek (za).

**Ê zodeng:**

Du movik dirêj: zan zan

Du movik kin: zen zen

Du guvişk dirêj: ang ang

Du goşî dirêj: zang zang

Du ker dirêj: az az

Du şikeste dirêj za za

Du tiqal dirêj aza aza

**Weke van ên kin:**

zen zen

eng eng

zeng zeng

ez ez

ze ze

eze eze

**Şikeste û movik dirêj û kin:**

Za zan ze zen zan za zen ze

Ze zan za zen zen za zan ze

**Ker û movik dirêj û kin:**

An zan en zen zan an zen en

En zan an zen zen an zan en

**Kit û movik dirêj û kin:**

A zan e zen e zan a zen

**Tiqal û movik dirêj û kin**:

A za zan e za zen eze zan eze zen

Zan aza zen aza zan eze zen eze

**Em karin movikan tevan bikin (zen).**

Guvişka bikin ing

Goşiya bikin zeng

Kera bikin en

Şikesta bikin za

Tiqa bikin eza

Kita bikin ê

**Heçîka birekê deng du şikeste û movik:**

Za za zeng ke sê kurd

**Du movik yek şikeste:**

Zen zen za hey kur do

**Şikeste movik şikeste:**

Za zen za wa kur do

**Movik şikeste movik:**

Zen za zen hem şe rin

**Ker û du movik:**

En zen zen em kur din

**Du ker û movik:**

En en zen ev en gaz

**Movik û ker û movik:**

Zen en zen her ev der

**Ker û movik û ker:**

En zen en ev der em

**Kit û du movik:**

Ê zen zen ê hem ber

**Du kit û movik:**

Ê ê zen ê î ran

**Sê movik:**

Zen zen zen kur dis tan

Em karin ê çar dengî kin bikin, di (lêpîv)ên xwe de, du movik du şikeste.

Zen zen za za zen za

**Du şikeste du movik:**

Za za zen zen za zen

**Movik û sê şikeste:**

Zen za za za zen za

**Sê şikeste û movik:**

Za za za za zen za zen

**Sê movik û şikeste:**

Zen zen zen za zen za

**Movik û şikeste (2):**

Zen za zen za zen za

**Şikeste û movik (2):**

Za zen za zen za zen

**Ê du deng ev in:**

Za za zen zen za zen zen za

**Du movik şikeste movik:**

Zen zen za zen

Em karin ê sê dengî kin bikin, di (lêpîv)ên xwe de, du şikeste û movik:

Za za zen wa ku rên

**Şikeste û du movik:**

Za zen zen va kur din

**Sê movik:**

Zen zen zen hem kur din

**Movik û du şikeste:**

Zen za za hem ka la

**Şikwste movik şikeste:**

Za zen za bê ben da

**Movik şikeste movik:**

Zen za zen hem kû re

Naxwe em karin bêjin di (ristehûn)ê de, (kerpeyv) hemî diçin, dimênî movik û (şikeste).

**Ker, guvişk û goşî dibin movik:**

Ek ink hing mer

**Kit dibin şikeste:**

E ma

**Tiqal dibî du şikeste:**

Ê kû ge lo

**Naxwe dengê (lêpîv) ma dido:**

Movik şikeste

Zen za

Wê ji van herdû (kitwaz)an hemî (lêpîv) çêbibin, bi pêş û paş xistina wan weke:

Zen za za zen

Ê dido dido ne.

Yan bi ducarkirina movikê û carekê şikeste di gel pêş û paş xistina yekî ji wan.

**Çaxê du movik li pêş:**

Zen zen za

**Movik li pêş û li paş:**

Zen za zen

**Herdû movik li paş:**

Za zen zen

**Her sê movik:**

Zen zen zen

Yan bi ducarkirina şikesteyê û careke movikê di gel guheztina pêş û nîv paş.

**Du şikeste li pêş:**

Za za zen

**Şikeste li pêş û paş:**

Za zen za

**Du şikeste li paş:**

Zen za za

**Em karin sê şikeste bênin:**

Za za za

Evê sê dengî bûne heşt (8). Ê dido dido tu bikî ser hev dibin çar çar. Lê, yê dî yê (çarî) de çênabe çar movik yan çar şikeste li dûv hev bên. Lewra ne xweşik dibin weke:

Za za za za zen zen zen zen

Lê, yek û dido û sisê çêdibin.

**Sê movik û şikeste**

**Sê movik li pêş:**

Zen zen zen zen za

**Du movik li pêş:**

Zen zen za zen

**Sê movik li paş:**

Za zen zen zen

**Sê şikeste û movik**

**Sê şikeste li pêş:**

Za za za zen

**Du şikeste li pêş:**

Za za zen za

**Sê şikeste li paş:**

Zen za za za

**Du movik û du şikeste:**

**Du movik li pêş:**

Zen zen za za

**Du şikeste li pêş:**

Za za zen zen

**Movik û şikeste movik û şikeste:**

Zen za zen za

**Şikeste û movik şikeste û movik:**

Za zen za zen

Lêpîvê çarî bûne (10)

Me berê gotiye malik du deng çênabe weke tu bibêjî, çi du movik û çi du şikeste û çi movik û şikeste û çi şikeste û movik, weke tu bibêjî:

**Kur din mer din kal din tal din**

Zen zen (2) zen zen (2)

**We re he re pî ro cî ro**

Za za za za za za za za

**We de ber de der ze gur ze**

Zen za (2) zen za zen za

**Ra din ba din ka lin za lin**

Za zen za zen za zen (2)

**Vêca ristehûn hene.**

**Ferdeng**: Ê ku dengê wan fer in.

Kêmê wan sê deng in, bêhtirê wan (15) deng in, di yek malikê de yanî çaxê kerta (hevgorî) dengê (14) û (15)an bin.

Weke tu bibêjî:

**Çi ma kur dê xwe dî qa lûç (8)**

**Ni ha bûn par se kû xwas (7)**

**Di yû ba vê e wan yek bûn (8)**

**Li hev î ro ne bû nas (7)**

Lêpîva wê sê birekê çarî ne û bireke sê dengî ne.

Kerta hevgorî di paşiya wê de du şikeste û movikeke, yanî:

Za za zen

**Se kû xwas**

**Ne bû nas**

Lêpîva yê çar dengî, emê li gor çar dengê malika pêşî çêkin.

**Çi ma kur dê**

Za za zen za

Emê hersêkê dî jî wilo çêkin, emê bibêjin:

Za za zen za (3) za za zen (1)

**Çi ma kur dê xwe dî qa lûç**

**Ni ha bûn par se kû xwas**

Za za zen za za za zen

Û çiqa malikê peyde bin, ku ji vê pîvanokê bin, wê (lêpîv)ê wan ev bin. Naxwe (lêpîv)a bireka nabe li gor dengê nîv û serê malikan, bes wê li gor (birek)a serê malika pêşî ya serê (ristehûn)ê bibin, û paşiya malikan ji xwe berê pîvaniya wê li gor wê be jî û hew.

Eva ferdeng ku kerta (hevgorî) berî dengê (14) û (15) bê, divê di cihê dengê ferde bê weke ku di (2) û (3)yan de bê.

Yan di (4) û (5) de bê hingî tu karî pazdehan bêjî û tu karî pir dirêj bikî.

Ya din (3) û (4) de ku pazde bin weke tu bibêjî:

**Em Kurd din bê qir din lê gur din**

Za zen zen za zen zen za zen zen

**Wek kun din bê gun din**

Za zen zen za zen zen

Hevgoriya di (3) û (4) de, ya bêhtirîn (15) dengan weke tu bibêjî:

**Ka we re ve ge re nû he re**

Za za za

**Vê de mê ba we re kû şe re**

Za za za

Çaxê kerta (hevgorî) dengê (4) û (5) bin û (15) deng bin weke tu bibêjî:

**He çî kur we rin em ê tev he rin**

Za za zen za zen (2)

**Li wan bi ge rin**

Za za zen za zen

Hevgorî di (4) û (5) ku bêhtirî (15)an bin, weke tu bibêjî:

**Hey ge lî la wa şûn gir rê ka wa**

Zen za za za za zen za za za za

**Bi ko mû da wa ra hê jin ca wa**

Zen za za za za zen za za za za

Ê çar dengî, bi kêmanî divê du (malik) bin (8) deng, ku (hevgorî) di çaran û heştan û duwazdehan de be. Tu karî pir malikan weke hev bênî û dirêj bikî.

Çaxê (hevgorî) neyê, divê ji (16) dengan bêhtir neyê.

Ya (hevgorî) di çaran de û (16) bên. Weke tu bibêjî:

**Hey he va lo rû şe ma lo nû re wa lo**

Zen za za za Zen za za za Zen za za za

Kûr rê ka lo

Zen za za za

Ya (hevgorî) di çaran de û bêhtir bin ji (16) dengan, weke:

**Gul lû nes rîn ni ha bûn şîn**

Za za zen za za za zen za

**Di ren gê xwîn mi nû kir bîn**

Za za zen zen za za zen zen

**Bi lez bûm dîn**

Za za zen zen

Ya (hevgorî) di (16)an de, weke tu bibêjî:

**1-Cî han he mî za nî ni ha**

Za zen za za za zen za za

**1-Kû ev ge lê kur dî kî ye**

Za zen za za za zen za za

**2-La wê ge lê ka sû me dû**

Za zen za za za zen za za

**2-Mi ta nû hem zû ba rî ye**

Za zen za za za zen za za

***

# Yasa pêlan

Emê niha vegerin li ser dabaşa (pêlan) û jendin û navlêkirina wan (lêpîv) û berpîvê wan.

Emê pêşî li ser pêlên (zodeng) axaftinê bikin.

Her pêlek jendina wê bi hawakî û pîvanekê ye. Evên dengên wan zo zo ne, ji (4) ta bi (16)an du nifş in; nifşek kerta (hevgorî) di paşiya çara (4) û şeşa (6) û heşta (8) de tên. Nifşê dî kerta (hevgorî) nayê, lê kerta (lêwest) tê. Yanî ya ku ne weke ya berî xwe ye. lê mirov di paşiya birekê de, lêdiraweste, û kerta (hevgorî) di paşiya (12)an yan (16)an de tê.

## Pêla çar deng

Pêla çar deng, deng zo (hevgorî) di çaran de, weke tu bibêjî:

**Em Kur do sin bi ko lo sin**

Zin zin za zin zin zin za zin

**Gu lû so sin em di po sin**

Zin zin za zin zin zin za zin

Vaye (lêpîv)a wê li gor malika pêşî tenê ye û hevgoriyên li paş malikê jî yek in.

## Pêla şeş deng

Pêla şeş (6) deng, bi (hevgorî) zodeng e. Weke tu bibêjî:

**Ge lî kur dê we lat**

Ze za zen za ze zen

**Va ye ro ja we hat**

Ze za zen za ze zen

Vaye (lêpîv)a wê li gor malika pêşî tenê ye. divê li gor hevgoriyê be.

Zodeng e, şeş deng e, servekirî, paşgirtî ye, yanî serî şikestî ye (ge), û paş movika (lat) e.

## Pêla heşt deng

Pêla ku (hevgorî) dengê (8)an ta bi deng zo be. Weke tu bibêjî:

**Ge lî kur dê we lat pa rêz**

Ze za zen za ze za zen za

**He mî ra bin bi ko çû hêz**

Ze za zen za ze za zen za

Vaye (lêpîv)a wê li gor bireka pêşî tenê ye. ku (ge lî kur dê) û li gorî hevgoriyê ye. lê ne li gor birekê dî ye. Di vê de, ji ber ku (du) çar deng di yek malikê

de hene, paşiya bireka pêşî ku dengê (dê) ye, kerta (lêwest) yanî mirov lêdiraweste û piçekî tê birin. Ev jî ser vekirî paşgirtî ye.

## Pêla diwazdeh deng

Pêla ku (hevgorî) di (12)an deye. Ev bi du hawayan çêdibe. Tu bikî sê, çar an du şeş dibe. Weke tu bibêjî:

**Hey peh le wa nê me**

Zen zen ze zen za ze

**Ra bin bi yek te nî**

Zen zen ze zen za ze

**Xwî na di lû çeh va**

Zen zen ze zen za ze

**Bû a gi rû je nî**

Zen zen ze zen za ze

Di vir de kerta (lêwest) di şeşa de ye û birekê wê dido û çar in (2) û (4) in. (lêpîv)a wê li gor bireka pêşî û (hevgorî) paşiya malikê ye û ne li gor ê dî ye.

Hawê dî ji bo ya (12) deng, çaxê kerta hevgorî dengê (11 û 12)an be û her birekek çar dengî bi kerta lêwesta çaran be. Weke tu bibêjî:

**Hey dil be rê ra be we re**

Zen zen ze za zen zen ze za

**Kez yan ve ke**

Zen zen ze za

**Şeh bî ne tû tem bo rî yû**

Zen zen ze za zen zen ze za

**Bis kan şe ke**

Zen zen ze za

Vaye (lêpîv) weke bireka pêşî tenê ye ne weke yê dî ye û jendina wê jî ne weke jendina ya şeş deng e.

## Pêla şazdeh deng

Pêla ku (hevgorî) dengê pazdeh û şazdehan be (15-16), hingî wê bibe çar birekê çar dengî, wê sê (lêwest) berî hevgoriyê bên. Weke tu bibêjî:

**Cî han he mî za nî ni ha kû ev ge lê**

Za zen ze za za zen ze za za zen ze za

**Kur dî kî ye**

Zen za ze za

**La wê ge lê ka sû me dû sû ba rû hem**

Za zen ze za za zen ze za za zen ze za

**Mî ta nî ye**

Zen za ze za

Vaye (lêpîv) li gor (bireka) pêşî û hevgoriya malikê ye û ne li gor wan birekê dî ye û jendina wê hawekî dî ye, çar dengî ye û zodeng e.

Pêlê zodeng bûye (6), ev her şeş deng zo tenê di wan de çêdibin (çar- şeş- heşt- şazdeh).

# Yasa

Çaxê di (lêpîv)ê de, sê şikest li dûv hev bên. Weke: /zen, za, za, za/ her sê şikeste bi tîpa (a) ne xweşik in, giran in, ya baş ewe, ku ya nêvî nizim bibe, em bibêjin / zen za ze za /, hem çaxê du şikeste jî dîsa wilo, weke: / zen za za /.

Em bibêjin: / zen ze za / çêtir e.

Da bêjeya li ser pêlên ferdeng, yanî yê ku dengê wan fer bin ne zo bin. Me berê gotiye kêmê wan sê deng in û bêhtirê wan (15) deng in.

Pêla sê deng bireka wê jî sê deng e û her birekek malike ke û du birek dibin du malik û dibin rêzek ji ristehûnê û zo têde çênabe û tu karî gelekî dirêj bikî; yên weke hev yan dido dido bin.

Ya sê deng û du malik, hingî wê (lêpîv) weke herdû malikan be, yan wê weke ya paşî tenê be.

Wek em bibêjin:

**De we rin em he rin**

Ze ze zen zen ze zen

**Ne ya ran bi da ran**

Ze ze zen zen ze zen

**Bi ê rîş bi kin tîş**

Zen ze zen zen ze zen

**Ne bi tirs ne bi pirs**

Zen ze zen zen ze zen

Vaye lêpîv, yan weke herdû birekê pêşî ye, yan weke (hevgorî)ya pêşî ye.

Ya sê deng ku gelek malik ji hev bin wek

**Em e vin wek he vin**

Zen ze zen zen ze zen

**Na ke vin na re vin**

Zen ze zen zen ze zen

Ya sê deng ku bû çar û hevgorî di paşbireka paşî tenê de hat û lêwest ne qetbêje be, û dengê sisiyan

be, hingî dibe du jendin, yan du sisê ne û yan çar û dido ne.

Weke tu bibêjî:

**He çî Kurd wek he vin**

**Ew bi şer na ke vin**

-Ku sisê sisê bin (lêpîv) ev e:

Zen ze zen (4) caran.

Ku dido û çar bin (2-4), (lêpîv) dibe:

Za ze zen zen ze zen

Li gor her du birekê serî ye.

## Pêla pênc deng

Ferdengê din ê (5) pênc deng ev jî ferdeng in, yanî (kitwaz) tê hijmartin, ji ber ku çaxê tu wê bikî zo û kit, emê bibêjin çar û yek, ev yekdeng di qetrista de nîne.

Ku em bibêjin sisê û dido ne, lêpîva du dengan heye. Lê dido nabin birekek. Naxwe wê (5) dengî be.

Lêpîva xwe dido û sisê bin û bi jendinê wê (5) bin; ê ferdeng û yek hawe be.

Ya pênc dengî weke tu bibêjî:

**Em Kurd dê ber rê man li vê de rê**

Zen zen za ze za zen zen za ze za

**Li pişt çe pe rê dû rî dil be rê**

Zen zen za ze za zen zen za ze za

Vaye (lêpîv) li gor malika pêşî tenê ye û ne li gor ê dî ye. lê, (hevgorî)ya tevan ji hev e, eva pêncan gelekî dirêj bike.

Herçîka pênc (5) dengî dibe sirûda nîv giran, çaxê ku serê wê movik be. Ku serê wê şikesta dirêj be, ew dibe ya berbûkan. Weke:

**Bû kê de la lê**

Za za zu zen zen

**Na zû şe pa lê**

Za za zu zen zen

Emê niha li ser (pêlên) tevlîhev baxivin, ên tevlîhev yanî yên ku pîvanok û birekê wê fer, zo û herdû têde hene. Weke: Heftan (7) û nehan (9) û yazdehan (11) û sêzdehan (13) û pazdehan (15).

Ev bûne (5)ê fer û zo.

Di van her pêncan de, ji xwe (lêwest) berî (hevgorî)yê tên.

Eger te (lêwest) di paşiya dengê (çarî) de anî, wê fer bimîne li paş.

Eger te (lêwîst) di paşiya ferê de anî, wê zo bimîne li paş ev (yasa) me di (heftan) û (yazdehan) û (pazdehan) de çêdibe. Herçîka (neh) û (sêzdehan) ev herdû (yasa)ke din ji wan re heye, piştî hersêkê berê, emê li ser wan bibêjin: Em vegeryan ser ya heftdeng a ku (lêwest) a wê çar berî sisiyan be.

Weke tu bibêjî:

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **La** | **wim** | **bi** | **dil** | **xwe** | **şê** | **rim** |
| Za | zen | ze | zen | za | ze | zen |
| **Gew** | **dê** | **xwe** | **na** | **ve** | **şê** | **rim** |
| Za | zen | ze | zen | za | ze | zen |

Vaye (lêpîv) li gor pîvanoka pêşî û hevgoriya pêşiyan, lê ne li gor ên dî ye.

Ya (heft) ku sisê berî çaran bin. Weke tu bibêjî:

Ez şê rim di ke le hê

Pi ling gê a sê ge hê

Zen za zen ze ze ze zen

(lêpîv) li gor herdûkê pêşî ye.

Yasa- çaxê her heft deng li dûv hev bêne gotin ew (huriza) sivik e. (4)

Ku çar berî sisiyan bin, dibe (axaftina bi hêrz). (5)

Ku sisê berî çaran bin, ew dibe (axaftin)a dibistanî. (6)

Pêla tevlîhev, du hawe ye û yazdeh (11) dengî ye. Ev çêdibe, ku zo berî ferê bê, û herweha çêdibe ku fer berî zo bê. Ya zo berî ferê du çar û sisêke wek em bibêjin:

**Gu la ser a nî ya qî zê** (7)

Ze za zen za za za zen za

**Çi şeng ge**

Ze zen ze

We ke sî mê bi pê çî tû (8)

Li pen gê

(Lêpîv) li gor pîvanoka serî û paşî ye, ne li gor ê dî ye. (Ev gazîdeya suxta ye).

Yan sisê û pênc û sisê, yanî fer û fer weke tu bibêjî:

**Gu la ser a nî ya qî zê** (9)

Ze za zen za za ze zen za

**Çi şen ge**

Ze za zen

Ev dibe dîloka teselî yanî; kin û dirêj û dîsa kin / kî berî kê/.

Pêlên (tevlîhev) û (yekrû) yanî; fer tenê. Pêla (nehan 9) û (pazdehan 15) ye.

## Pêla neh deng

Dengê wê fer in. Lê, tu karî pîvanokê wê bi sê hawan çêbikî. Tu karî zo berî fer bibêjî. Weke:

Bê en dî şim ji ber ku la te

Za zen za zen ze zen ze za zen

Des te da win li ser ci la te

Vaye (lêpîv) weke herdû malikê pêşiyan û hew. Jendina wê di navbera sitiran û dîlokê de ye.

Ya neh (9) ku fer berî zo be yanî (5) berî çaran bin. Weke tu bibêjî:

**Ke sek ne ra zin vê de ma nû**

Ze zen za za zen za ze za zen

**Bin des tî zo rî tev ni ha çû**

Ze zen za za zen za ze za zen

Lêpîv weke herdûkê berê tenê ye. Ev sirûda nîvgiran e.

Pêla nehdeng (9) ku fer tenê be yanî sisê sisê bêne ajotin. Weke tu bibêjî:

**Bin des tî ku ta bû vê de mê**

Zen zen za zen zen za za ze zen

**Bi sa ya xwen di nû ke le mê**

Zen zen za zen zen za za ze zen

Lêpîva li gor bireka pêşî û paşî ye û hew. Ev niha bû dîloka çepkan.

## Pêla pazdeh deng

Pêla (15) deng ew jî tevlîhev û yekrû ye. Ya ku zo berî fer be, yanî sê, çar û sisê yek be.

Weke:

**Çi ma kur dê xwe dî da sik**

Ze za zen za ze za zen za

**Ni ha tev bû ne par sek**

Ze za zen za za zen zen

**Ge lek so la di kin pî na**

**Di ma lê de ne bû çek**

Lêpîv weke bireka pêşî û paşî ya rêzê ye û ne weke yê dî ye. Dîloka bi giranî ye.

(15) dengî ku (sê deng) berî sê çaran be. Weke:

**Çi ma em ni ha na çin**

Ze za zen ze za ze zen

**We la tê xwe ru ha na kin**

Ze za ze zen ze za ze zen

**Di vê kû bi vê do zê**

Ze za zen ze za ze zen

**Li cî ha nê xwe şik ba kin**

Ze za ze zen za za ze zen

Ev dîloka nîv girane keys lê hatiye.

Vaye (lêpîv) li gor malika pêşî û paşî ye û ne weke yê dî ye.

Ya (15) dengî yekrû, yanî fer tenê: Sê, pênc. Weke:

**Çi ma em ni ha di çin ber de war**

Ze za zen ze za ze za zen ze za

**Li ço lû çî ya**

Ze za zen ze za

**Me pir sek ne kir li ja rê we lat**

Ze za zen ze za ze za zen ze za

**Li pi rû bî ya**

Ze za zen ze za

Ev sirûda nîv girane.

Vaye (lêpîv) li gor malika pêşî ye.

Ya pazdeh (15) pênc, sisê, weke tu bibêjî:

**Çi ma em di rû nin te vî kû**

Ze za zen ze za zen ze za zen

**Ne yar tev şi ya rin**

Ze za zen ze za zen

**He ger em we ha bin bi dij min**

Ze za zen ze za zen ze za zen

**Ti car em ni ka rin**

Ze za zen ze za zen

Ev huriza sivik e.

Ev bûn çar hawe di pazdehan de.

## Pêla sêzdeh deng

Ya sêzdeh dengî (13), ew jî zo û fer herdû ne, lê fer tenê nîne.

Du çar û pêncek. Weke:

**Bi ha ra min di vê sa lê**

Ze za ze zen ze za ze zen

**Çi qa şê rî ne**

Ze za ze za ze

**Gu lê tê de ze rû so rin**

Ze za ze zen ze za ze zen

**Çi geş pe rî ne**

Ze za ze za ze

Vaye lêpîv li gor bireka pêşî û paşî ye.

(13) -pênc berî çaran. Weke:

**Bi ha ra min çû gi ya ê wê**

Ze za ze zen za ze za za za

**He mî zer bû**

Ze za zen za

**Min ew gul ne dî ma di dil de**

Ze za ze zen za ze za za za

**Çi ke der bû**

Ze za zen za

Ev peyvana nîv civate û nîv gazîde ye.

(13)- çar, pênc, çar . weke:

**Ew ku la dil dî ti na wê bû**

**Mi ew ne dî**

**Piş tî hin gî ez ma me bê kes**

**Hem bê xwe dî**

Ev nifşek ji sitirana ye.

Zen ze za zen za ze za za zen

Zen ze za zen

Ê ferdeng (17) jî çêdibin, lê bê kam e. Weke:

**Ev cî han he mî za nî ni ha**

**Ev ci hê za zû kur da ne**

**Res te mû ka we her dû li ser**

**Vî ci hê xwe şik ra za ne**

Sirûd û dîlok pey hev de.

(18) deng jî çêdibe, lê bê kam e. Weke:

**Ev cî han he mî za nî ni ha**

**Her kû ev ge lê kur dî kî ye**

**Pey de ma ê ge lê ka sî ye**

**Pir ke vin çû dî yû ma dî ye**

Ev herdû jî pir dirêj dibin, pîva ji bîra mirov diçe. Heye durist be û heye nedurist be, lê yê fer bêhtir ji hevdehan (17) û yê zo bêhtir ji hejdehan (18) in. Çaxê ku hevgorî di nêvî de tine bin, yanî ne malik bin, birek bin ew bêgoman çênabe.

Birayên xwêner, emê dîsa bi kurtî li ser (lêpîv)ê baxivin. Lê emê hinek tiştan ji yê berê me gotî emê kêm yan bêhtir bikin. Lê li gor movik û şikestan tenê emê van bêne çêkirin.

Du deng

Sê deng

Çar deng

Pênc deng

Şeş deng

Ji van pêve wec bi wa nîne, çikû:

| | |
|---|---|
| Heft | wê ji çar û sisiyan be |
| Heşt | du çar in |

Neh sê sisê yan çar û pênc

Deh du pênc yan çar û şeş

Yazdeh şeş û pênc yan du çar û sê

Diwazdeh du şeş yan sê çar

Sêzdeh du çar û pênc yan şeş û heft

Çardeh du heft yan du çar û şeş

Pazdeh sê pênc yan pênc, sisê yan du çar û heft

Şazdeh çar çar yan du şeş û çar

Em karin şeşa û didiwa jê bavêjin, lewra çar cihê herdûkan digire, çar û nîv dibe şeş, nîvê çara dido dido ye.

**Sê deng**:

Zen zen za za zen za

Za zen zen za za zen

**Çar deng:**

Zen zen zen za za zen zen zen

Za za zen zen zen zen za za

**Pênc deng:**

Zen zen za zû zî

Za zû zî zen zen

Zen zen zen za zû

Za zû zen zen zen

**Şeş deng:**

Zen zen zen za zû zî

Za zû zî zen zen zen

Zen zen za zû zen zen

Za zû zen zen za zû

**Ê du deng:**

Za zû zen zen za zen

Zen za

Vêca yê dido ji xwe lêpîv û berpîv wek hev in.

**Ê sisê:**

Li ser û bin binêre, ew jî wê weke hev derkevin.

**Ê çar:**

Li ser û bin meyzêne pêşî li pêş dûv re li paş du movik, yan du şikeste li ku bin li gor wê bibêje.

**Ê pênc:**

Guh bide pêş û paş, dûv re guh bide paş, dûv re guh bide pêş.

**Ê şeş:**

Guh bide pêş û paş, çaxê movik û şikeste li pêş û paş yek bin, dûv re dido li kîjan alî bin guh bide wir, dûv resisê li ku bin guh bide wir.

**Heft weke çar û sisê:**

**Heşt**: Du çar in. **Neh**: Çar û pênc in.

**Deh**: Du pênc in. **Yazdeh**: Pênc û şeş in.

**Diwazdeh**: Du şeş in. **Sêzdeh**: Du çar û pênc in.

**Çardeh**: Du heft in. **Panzdeh**: Sê pênc in.

Yan sê çar û sisê ne.

**Şazdeh**: çar carî çar in.

Hinek ji wan û bêhtirê wan jî di yek hijmara denga de pîvana birekê wê bi du, yan sê hawa tê.

**Pêşî weke pênc dengî**

Heye pênc deng bi hev ve û heye du deng û dûv re jî sê deng dîsa dibe pênc.

**-Ê pênc deng bi hev ve ev in:**

Çaxê ku dengekî tenê di pêş de cuda be û herdû dengên pey de yan sisê yan çarê dî ji yek bêjeyê bin, ew pênc têne gotin. Weke (1):

**Li kur dis ta nê nîv gu lis ta nê**

Vaye dengê (li) pêş de cuda ye û (kur dis ta nê) çar deng in û yek bêjeye û: (nîv gu lis ta nê) jî wilo ye.

Lê çaxê ku ji pênc dengan herdûkê serî yek bêje bin û hersê dengê dî cuda bin, hingî du deng û sê deng in. Weke (2):

**Ge lî gun dî yan ku rê cun dî yan**

Vaye bêjeya (ge lî) du deng in ji hev in û bêjeya (gun dî yan) sê deng in bi hev re ne.

Vêca lêpîva (li kur dis ta nê) û ya (gun dî yan) wê ne weke hev be.

Yan pêşî wê lêpîva pêncê bi hev ve be. Weke:

**Em kur dis ta nê** pênc bi hev ve.

Zen zen za zû zî pênc bi hev ve.

Pêncê ne bi hev ve, yanî (2 û 3). Weke:

**Ge lî gun dî yan** (2 û 3) ne.

Za zen/ zen za zen (2 û 3) ne.

3-Weha reng e (heft deng) dido û pênc. Weke:

**-ne yar/ hin dî dij wa re**

Za zen/ zen zen za zû zî

**-bi kurd/ hê ji ni ka re**

Za zen/ zen zen za zû zî

4- **Heft dengî**

Sisê û çar in. Weke:

**Em kur din / ser ev ra zin**

Zen za zen / za zû zen zen

**Lê her dem / em na ra zin**

Zen za zen / za zû zen zen

Di vir de (3) cuda ne ji çaran (4).

5- **heft dengiya bi hev ve**

Çaxê ku dengek tenê di serî de cuda be, ew bi hev ve ye, yan ji serî de bêjeyeke dirêj be, ya yek li pêş. Weke:

**Ez di we la tek xwe şim**

Zen zen za zû zen za zen

**Lê dil gi ra nû re şim**

Lêpîv hingî wê çar û sisê bin.

Guvaşeka paşî ji bo lêpîva ev e:

(5) sing in û yê dî (jêvedane). Ê sing ev in:

-Dido za zen / zen za

-Sisê zen za zen

Za zen za

-Çar za zû zen zen

Zen zen za zû

-Pênc zen zen za zû zî

Za zû zî zen zen

-Şeş za zû zen zen za zû

Zen zen za zû zen zen

Ev her şeş weke me daniye, her yekî du hawe ne.

1- Ser (şikeste) û vekirî
Paş (movik) û girtî
2-Ser (movik) û girtî
Paş (şikeste) û vekirî

Naxwe em guhdariyê tim li paş dikin, çikû kerta (hevgorî) tim li paş e.

Û deh lêpîvên din hene, ew (jêvegirtî) ne. Yanî ji daneberheva her pêncê berê çêdibin.

**=1=** Ê jêvedan ê fer:

7- 7tin ( 2 û 5 3 û 4)
Ya 7- yek ker (4 û 3) :

Zen zen za zû zen za zen

Ya 7- (2 û 5) :

Za zen / zen zen za zû zî

Ya 7- ( 3 û 4) :

Za zen za / zen zen za zû

**=2=** Ya ferî jêvedan (9) dengî:

Ya 9- yek ker:

Ya ku (lêwest) bikeve nava bêjeyê ku ji hev qut dibe, pênc û çar in (5 û 4).

Zen zen za zû zî / za zû zen zen

Yan (9) (4 û 5) :

Za zû zen zen / zen zen za zû zî

Ya (9) (6 û 3) :

Zen zen za zû zen zen

Za zen za

Yan (9) ( 3-3-3) :

Za zen za / za zen za / za zen za

**=3=** Ya ferî jêvedan (11) dengî.

Yek ker (8 û 3) :

Za za zen zen za za zen zen /za zen za

Ya 7 û 4 :

Za za zen zen za zen za / zen zan za za

Ya (5 û 6) :

Zen zen za zû zî

Zen zen za zû zen zen

**=4=** Ya ferî jêvedan (13) deng:

Ya yek ker (8 û 5) :

Za zû zen zen za zû zen zen

Zen zen za zû zî

Ya (5 û 5 û 3) :

Zen zen za zû zî / zen zen za zû zî

Za zen za

Ya ( 7 û 5) :

Zen zen za zû za zen za

Zen zen za zû zî

Ya (15) ferî jêvedan:

Ya yek ker (8 û 7) :

Za zû zen zen za zû zen zen

Za zen za zen zen za zû

Ya (4-4-4-3) :

Zen zen za zû/ zen zen za zû/ zen zen za zû

Za zen za

Ya sê pênc (5-5-5):

Zen zen za zû zî

Zen zen za zû zî

Zen zen za zû zî

**Pêlên zodeng ên jêvedan:**

8 û 10 û 12 û 14 û 16 . Ev bûne pênc.

1-Ya (8) yek ker (6 û 2):

Za zû zen zen za zû

Za zen

Ya du çar (4 û 4):

Za zû zen zen / za zû zen zen

Ya (5 û 3):

Zen zen za zû zî

Zen za zen

2- Ya (10) (5 û 5) du pênc:

Zen zen za zû zî / zen zen za zû zî

Ya (10) (6 û 4):

Zen zen za zû zen zen

Za zû zen zan

Ya (10) (3-4-3):

Za zen zen/ zen zen za zû/ zen zen za

3- Ya zodeng (12), yek ker:

Ya (3-6-3):

Za zen zen/ zen zen za zû zen zen

Za zen zen

Ya (12) sê caran çar (3x4):

Za za zen zen / za za zen zen

Za za zen zen

Ya (12) çar caran sisê:

Zen zen za / zen zen za
Zen zen za / zen zen za

4- Ya zodeng (14) ya yek ker:
Ya (3-6-5):
Za zû zen / zen zen za zû zen zen
Zen zen za zû zî
Ya (14) (4-4-4-2) :
Za zû zen zen/ za zû zen zen/za zû zen zen
Za zen
Ya (14) du caran heft (7-7):
Za zû zen zen zen za zû
Za zû zen zen zen za zû

5- Ya zodeng (16):
Ya yek ker (2-6-6-2):
Za zen / za zû zen zen za zû
Za zû zen zen za zû / za zen
Ya (16) (6-2-6-2):
Zen zen za zû zen zen/ za zen
Zen zen za zû zen zen / za zen
Ya (16) ( çar caran sisê û çar) (3-3-3-3-4):
Za ze zen/ za zen zen/za zen zen/za zen zen
Za zû zen zen
Ya (16) du caran 6 û 4 (6-6-4):
Za zû zen zen za zû/ za zû zen zen za zû
Za zû zen zen

Vêca, heger (pêl) li gor dengan be (15) pêl in, ji ber ku dirêjiya malikan ji du dengan ta bi (16) dengan çêdibe. Heger em li gor jendin û birekan çêkin dibin nêzîkî çil pêlî.

Ku em ser û paş malikên girtî û vekirî jî çar caran çil çêbikin, yanî nêzîkî (160) pêlî çêdibin.

Yasake dî heye, ji bo ristehûna di hijmara dengan de, em bibêjin tu karî çar malikan çare çar bênî û didiwa pey wan de pênce pênc bênî. Weke:

Hey la wê şêr bê tir sû mêr
Ra hê je kêr da kev zi nêr
He çî ka ê têr
Ber pêş bi kin zêr

Û her wilo gelek hawe hene.

Yasake din, tu karî (hevgoriya) sê malikan yan ya çendan bikî bi yek hawî yek tîpî û ya paşî, yan ya berî paşî bikî tîpeke din. Weke:

Em kur dê ger din hê ja û mer din
We lat ne ber din bi kin cen gû şer

Yan weke:

Kur dê we la tim ez pir xe ba tim
Li ser ne yar ra pê tû şe wa tim

Û her wilo bi gelek hawên din jî çêdibin.

# Asarist

Bêjeyên babetî û ristan

1- Ristehûn: Hûntina ristan- Hijmara bireka.
2- Jendin: Gotina bi dîlokî.
3- Pêl: Hawê ajotin û jendinê.
4- Deng: Her (movik) û (şikestek).
5- Malik: Her ristek (2) malik in.
6- Pîvanok: Pîvana birekan.
7- Birek: Her malikek yan (1) bireke û heye (2) – 3- 4- 5- 6 birek bin.
8- Qetrist: Her birekek heye (1) bêje be, heye nîv bêje, heye bêje û hinek ji ya dî be.
9- Hevgorî: Ew qetê li paşiya malikê ku du malikan dike li gorî hev di tîpê nerim û movik û şikestan de.
10- Mehrek: Ew tîpa ku di qeta (hevgorî) de tê guhertin, da bibin du malikê babetî hev weke ku dibin jin û mêr û li hev tên mehirkirin.
11- Girtin û vekirin:

Girtî: (movik) mîr, kal, sir.

Vekirî: Şikesteya bi, ba, bû.

12-Lêwest: Kerta ristê ku ne li gorî hev bin, tê li paşiya pîvanokê. –Tu lê dirawestî.
13-Hêwir: Her pêlek bi hawakî tê nehwirandin.
14-Sing: Hîmê dengê ristê ne, ku 2-3-4-5-6- (bûne pênc).
15-Jêvedayî: Şaxê dengê ristê ne, ku ji van pêncê berê vedikevin. Ew jî ev in: 7-8-9-10-11-12-13-14-15-16 . (Ev jî bûne deh).
Tevde bûne pazdeh (pêl).
16-Zodeng: Dengê dido dido: 2-4-6-8-10-12-14-16 (Ev bûne heşt pêl).
17-Ferdeng Dengê ku yek tenê li paş bimênî: 3-5-7- 9- 11- 13- 15 (Ev bûne heft pêl). Tev bûne pazdeh.
18-Movik: Sê tîpên: Ziwa, nerim, ziwa. Weke: pir, jir, kal ... .
19-Şikeste: Du tîp in: Yeke ziwa yeke nerim. Weke: ki, ma, bu, ze, we ... .
20-Tevlîhev: Zo û fer bi hev re, di yek ristê de tên.
21-Yekdeng: Ew rista ku malika paşî têde tim ji hev be, piştî ristan tevan.
22-Kam xweş: Ew malika ku li paş a berî paş hevgorî ya wê ne, ji yê berê be, ew kama wê xweş dike.

23- Çeper: Ew malika ku li paş tê û ji yê berî xwe dirêjtir e, çi hevgorî yek bin û çi ne yek bin.
24- Lêpîv: Ew bêjeyên dengî ku me ji (zingîn)ê çêkirine û em ristan li wan digirin. Weke: zen za zû zî .
25- Berpîv: Ristê ku li gor van jendinan têne gotin hem tê gotin pîvanok.
26- Gul: Tê gotin ji bo (mehrek) û hevgoriya ku weke hev tê di paşiya her hijmarekê weke hev de. Weke:

Keçka Mîtanî (tanî) gul e.

Li waşûkanî (kanî) gul e.

27- Bûk: Ev jî bi pîvan û mehrek û hevgoriya weke gulê ye, lê divê gulek di cihê xwe de, lê bi kurt be, yanî hatibe gotin û dûv re ew bûk piştî hijmareke dirêjtir ji ya berî gulê be. Weke:

Hey gulbiharê (harê) gul e

Nazikê mamiz û karê (karê) bûk e.

Lewra (karê) dengê (4 û 5)ye û (karê) dengê (7 û 8)ye. Naxwe ev rista bi gulbûkê çêdibe. Gul berî bûkê, yan bûk berî gulê yan tim (gul) di malika kin deye û (bûk) di ya dirêj deye. Weke:

Dilberê nazik û şengê bûkê

Her wekî pengê gul e.

Her pêlek=ristek (15 rist ji 15 pêla).

-Rista du deng, du malik:

Kurd in – gurd in / harin mar in

Şeng e – peng e / jîr e çîr e

Lêpîv: za zen zen za

Navê wê xurt û hûr li gor (hasin kut).

-Sê deng: Em pir in pir çir in

Lêpîv: zen za zen za zen za

Bilinda nerim e – huriza sivik

-Çar deng: Em ci wa nin wek be ra nin

Lêpîv: za zû zen zen zen zen za zû

Bi xumxum – beza hespan

Ev we la tê mi ne

Bê se rû bê bi ne

-Pênc dengî: Ge lî he va lan – pis ma mû ka lan

Lêpîv: zen zen za zû zî - za zû zî zen zen

Fireh û nerim e - sirûda nerim e

-Şeş dengî: za zû zen zen za zû

zen zen za zû zen zen

Dirêj û lihevketî - ser - dirêj

Ev her pênc sing in ê piştî va re, şax in ji van çêdibin. Jê veketî ne.

-Heft dengî: Em qî zê na ze hî nin
Ter xê gu la di çî nin
Lêpîv: za zû zen zen zen za zen
zen zen za zû za zen za
Paşvegere: Hilkutana sivik
-Heşt dengî: Van dij mi na der bas ne kin
da ew rî yê Kurd nas ne kin
Lêpîv: zen zen za zû zen zen za zû
Nizim û dirêj – sirûda giran
Neh dengî: kur dê we lat tev de bi bin yek
her ne çi ya hem hil gi rin çek
Lêpîv: zen zen za zû zen zen za zû zî
za zû zen zen za zû zî zen zen
Dirêj – pêş û paş – sirûda nîv sitiran.
Deh dengî: ge lê me ra bû va hûn di bî nin
Di vê kû her kes xwî nê bi şî nin
Lêpîv: za zû zî zen zen za zû zî zen zen
Zen zen za zû zî (2) caran
Nîv giran û rast û çep huriza giran.
-Yazdeh dengî: Di vê ku em ji vê a lê bi çê nin
Ji bo ser bes tî yê em pê bi bî nin
Lêpîv: za zû zen zen za zû zen zen za zen zen
Xwar û pêçik – dîloka şîn û girî.
-Diwazdeh dengî: He va lê min we rin cen gê

bi mê ra nî
bi kin go rî ji bo kur da
e vî xa cî
Lêpîv: za zû zen zen (3) caran
zen zen za zû (3) caran
cengî ji hev qut – gazîda suxtan
-Sêzdeh dengî: He mî ra bin we rin îro
da em he rin jor
Ji bo ku em ji ser kur da
zû hi lê nin zor
Lêpîv: zan zû zen zen za zû zen zen
za zû zî zen zen
zen zen za zû zen zen za zû
zen zen za zû zî
Sergiran û paş sivik dîlok û sirûd.
-Çarde dengî: Ma ne tu ku rê res te mê
za lî tu bi nê re
jê ra vî ci hî pet ro la re şe
he mî zê re
Lêpîv: zen zen za zû za zen za
zen zen za zû za zen za
za zû zen zen za zen ze
za zu zen zen za zen ze
Ser dirêj û paş hefsar gazîdana dirêj.

Pazdeh dengî: We la tê min bû ê kû li ser
wî bû ye cen gû şer
bav û ka lê me li ser wî
di jîn li ser ki rin ger
Lêpîv: za zû zî zem zem (2) caran
zen zen za zû zî (2) caran

Jor û jêr nîv giran sirûda bi nalîn

-Şazdeh dengî: Cî han he mî za nî ni ha
ku ev ge lê kur dî kî ye
La wê ge lê ka sû me dû
mî ta nû hem su ba rî ye
Lêpîv: za zû zen zem (4) caran
Zen zen za zû (4) caran

Pêla – sivik û bê serî teplinga leşkerî.

# Hinek nifşên ristan

- **Ya paş – Yek reng:**

Kurdistan a min dar û devî ne
Cot û cobar in bax û zevî ne
Bihuşt û naraz (2)
Em lê dirûnin em lê diçênin
Em dan û azox tê de hiltênin
Bihuşt û naraz (2)

- **Ya bi çeper:**

Heçî kur werin emê tev herin
Heçî hemberin li wan bigerin
Ser û destê wan ji wan bibrin

Eva paşî çepere weke du malikê dirêj e.

- **Ya bi gul û bûk:**

Hey gulbiharê
Nazikê mamiz û karê

Eva paşî bi bûk e, ji ber ku ji ya pêşî dirêjtir e û mehrek têde hatiye.

- **Ya xweş kam:**

Kurdo şiyar be herdem li kar be

Zû rabe ser xwe          bendî hewar be

- **Vaye ya sisiyan:**

  Xweşkame: Ne ji wan hersêkê dî ye.

  Yeke dî xweşkamî:

  Em tevde mêr in          piling û şêr in

  Dijmin dihêrin          her kes dizanî

Vaye ya paşî ne , ji yê berê ye û ew xweşkam e.

***

## Kurtejiyana Mela Nûriyê Hesarî:

**Dilawerê Zengî**

Di sala 1934an de, li Hesarê, gundê Kercewsê, jidayik bûye. Di nava Kurdan de, bi nasnavê Seydayê Pirêşan tê naskirin. Navê diya wî Xanim e, navê bavê wî Mela Yûsifê kurê Emer e. Emer ji gundê Hêştirekê, ji malbata Etmanka, ji şaxê Elikan, ji rema (Hoz) Hevêrkan bûye.

Mele Nûrî ji malbateke xwenda, zana û bîrewer hatiye. Bavê wî Mela bûye, diya wî jî keça melan û jineke xwenda bûye.

Di sala 1939an de, pêşî li cem diya xwe (Xanim) dest bi xwendina Qur'anê kiriye, û li cem wê Mewlûd, Nehculenam, Nûbihar û Rewdne'îm xwendine.

Di sala 1940î de, çaxê ku diya wî li Hesarê giyanê xwe spartiye Xwedê, îcar wî li ba kekê xwe Mela Hisên xwendiye. Lê çaxê ku kekê wî çûye leşkeriyê, îcar bavê wî ew xistiye dibistana bi zimanê Tirkî de, ya ku li Hesarê bûye.

Di 1945an de, çaxê di nofa (sinif) çaran de, dibistana Tirkî dixwend, bavê wî jiyana xwe spartiye Xwedê. Îcar kekê wî Mela Hemîd ew ji dibistanê derxistiye û daniye ber xwendina med-

resê. Piştî demekê, ew û kekê xwe Mela Nezîr, çûne gundê Bilêderê, û li cem birayê xwe yê ji dê mane. Pişt re çûye mala xalê xwe Mela Mihemed, li gundê Êlihê (Niha bûye wîlayet û jê re Batman dibêjin), maye. Ji wir jî çûye gundê Kurrika li Bişêriyê, li medreseya Mela Hesenê Tilmizî xwendiye û ders ji Mela Faîqê kurê Mela Hesen girtiye. Piştî demekê ji wir şûnde vegeriyaye û çûye Hesarê. Ew û kekê xwe Mela Hemîd, ji bo xwendinê daketin Binxetê û çûne cem mala Şêx Ehmedê Xiznayê. Li wirê dîsa li cem kekê xwe Mela Hemîd xwendiye heta ku "Sadulaha Gewra" bidawî kiriye.

Di sala 1949an de, birayê wî Mela Hemîd, çaxê xwendina xwe ya medresê kuta kiriye, di Kanûna Paşî de, vegeriyaye Hesarê, lê Mela Nûrî li Xiznayê maye, îcar li cem Mela Beşîrê Batêrgizî xwendiye. Lê, di dehê meha Heyvdarê 1950î de, Şêx Ehmed çaxê giyanê xwe spartiye Xwedê, ji wir çûye Tilmarûfê û li ba şêx Eladînê kurê Şêx Ehmed xwendiye. Mela Nûrî li wirê bûye pêbawerê Şêx Masûmê kurê Şêx Ehmedê Xiznayî.

Mela Nûrî di 20-saliya xwe de (1954), dest bi nivîsandina bi zimanê Kurdî kiriye, û berhemên xwe hemû bi alfabeya latînî nivîsandine. Camêr

digel wê perîşanî, dilêşanî û xizantiya xwe, deh pirtûk kirine malê Pirtûkxaneya Kurdistanê.

Ji destpêka sala 1967an ve, Mela Nûrî li bajarê Qamişlo – Rojavayê Kurdistanê dijiya.

Piştî nexweşiyeke dûrûdirêj, di roja 25. 01. 2011an de, Mela Nûriyê Hesarî (Pirêşan), ji nav me barkir û li goristana Qidûr Begê hate binaxkirin.

Mela Nûriyê Hesarî çend xelat û rêzname wergirtine, wek:

-Xelata Cegerxwîn a afirandina helbestê (2008)

-Bawernameya rêzgirtinê ji festîvala helbesta Kurdî ya 12an li Sûriyê (2007).

-Rêznameyek ji dîdargeha çand û hunerê û kovara Mewasim (2014).

**Ji berhemên wî:**

- Şoreşa Barzanî: Helbest, 1995

-Hostanîbêja Zarhaweyên kurdî, çapa yekem, Weşanxaneya Çanda Kurdî, Stockholm 1996

-Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî, çapa duyem, Qamişlo, 2024

- Axlîma: Pêlên Helbesta kurdî, 1996, Şam.

- Rêziman: (Destnivîs).

- Ferhenga kurdî – kurdî, (Destnivîs).
- Ferhenga kurdî – tirkî, (Destnivîs).
- Ferhenga Kurmancî- Zazî, (Destnivîs).
- Vegerandina li ser Zimanê erebî (Şarvîn), (Destnivîs). (تأويل اللغة العربية)
- Koledar: Çîrokek Helbestane ye, (Destnivîs).
- Du Mar: Çîrokek Helbestane ye, bi zimanê Erebî ye. (Destnivîs).
- Bîranîn, ji jiyana wî, (Destnivîs).
-Mewlûda Pêxember (Zanhaweya Pêxember), Qamişlo, çapa yekem, pêşgotina Dilawerê Zengî, çapxaneya Beyan, 2024.
-Dîwana Mela Nûriyê Hesarî bergê (3)yan, pêşgotina Dilawerê Zengî, çapa yekem, li bajarê Qamişlo, li çapxaneya Mîran, sala 2024an hat çapkirin.
- Dîwana Mela Nûriyê Hesarî bergê (4)yan, pêşgotina Dilawerê Zengî, çapa yekem, li bajarê Qamişlo, li çapxaneya Mîran, sala 2024an hat çapkirin.
-Axlîma (pêlên helbesta kurdî), pêşgotina Dilawerê Zengî, çapa duyem, li bajarê Qamişlo, li çapxaneya Mîran, sala 2024an hat çapkirin.

***

# Pêrist

Pêşgotin ........................................................................5

Axlîma (*Pêlên helbesta kurdî*) ......................13

Ristehûn ..........................................................................21

Mercên ristehûnê ..................................................22

Lêpîv ......................................................................................24

Yasa pêlan ............................................................................52

Yasa .............................................................................................58

Asarist...........................................................................................85

Hinek nifşên ristan...............................................92

Kurtejiyana Mela Nûriyê Hesarî ..........................95

Pêrist ...........................................................................................99

***